


Ev pirtûk çîrokek e ku ji bo wenda nebe, di guh de bi pistepist hatiye gotin. Çîroka wan kesane ku yên destên wan li bîr, zarokatî, kolan, ziman û derîyê gelekê dikeve..

Ev çîrok behsa wê yekê dike ku cihekê ku demekê her kes tê re derbas dibû, çawa ji bîra gel hatiye jêbirin, lê di heman demê de ew bîr çawa li ber xwe daye, çawa kok berdaye, di sêhra çîrokekê de, lê bi rastiyeka req vedibêje.

Ev ne tenê çîroka heft xwişkan e, çîroka wan kesan e ku piştî her tiştê hatîye wendakirî, bêdeng nemane û vegotin hilbijartine. Ji ber ku bîr anîn, vegotina van tiştên tê bibîranîn, li dijî jibîrkirinê berxwedanek pêhempaye.

Ji ber ku carinan çîrokek, şewqek e ku ji şibakeyeka şikestî de derdikeve



Bandrol Uygulamasına İlişkin ve Esaslar Hakkında Yönetmeliğin 5 inci maddesinin ikinci fıkrası çerçevesinde bandrol taşıması zorunlu değildir.

EV PIRTUK BI PERE NAYÊ FIROTIN

# BIRCA KEÇIKAN

Nivîskar Yekta FERAT

Wêne Ruşen YAKUT



**Nivîskar:**
Yekta Ferat

**Wêne:**
Ruşen Yakut

**Berpirsyarên Projeyê:**
Çiğdem Ertak, Eylem Kaya, Gurbet Gözde Engin,
Mazlum İlter, Ruşen Yakut

**Navê Projeyê:**
Ji Min Re Çîrokan Ne Bêje

adalet iyileştirir

HAKİKAT ADALET HAFIZA MERKEZİ
HAFIZA MERKEZİ

Avrupa Birliği tarafından
ortak finanse edilmektedir


Ev pirtûk di çarçoveya projeya "Edalet Baş Dike" ku ji aliyê Yekîtiya Ewropayê ve bi hevkarî tê fînansekirin û bi piştgiriya wê hatiye amadekirin. Projeya "Edalet Baş Dike" ku di navbera salên 2000-2015an de li başûrê rojhilata Tirkiyeyê li ser binpêkirinên mafên jiyanê yên li dijî zarok û ciwanan disekine, dike armanc ku bi rêya berhevkirina daneyan, destwerdanên hiqûqî, parêzvaniyê û piştgiriya ji bo mexdûran, bi nêzîkatiyeke tevayî ya ku têkoşîna li dijî cezanekirina binpêkirinên mafên mirovan bi nêzîkatiya edaleta veherîner re têkildar dike, pêş bixe. Berpirsiyariya naverokê bi temamî ya xwediyê projeyê ye û nêrînên Navenda Bîrê û Yekîtiya Ewropayê nîşan nade.


Serê sibeheke biharê bû. Bajar ji mirovan xalî bû. Di kuçeyên teng û dirêj de pîrejinek, bi tena serê xwe dimeşiya. Pîrejinê bi uftekuft xwe gihand serê kuçeyê. Gopalê xwe spart sînga xwe, demekê wisa ma û têra xwe bêhn veda. Dîsa gopal da ber xwe û meşa xwe ya têraramî domand. Carekê serê xwe rakir li ezmên temaşe kir. Ezman jî wek kuçe û kolanan ji stêrkan xalî bûbû. Di kêmroniya destê sibehê de tenê heft stêrkên çilmisî mabûn li ser rûyê ezmên. Çer ku pîrejinê li ezmên temaşe kir, heyvê baz da û çû xwe li pişt ewrekî veşart.





Pîrejinê hêz da xwe û meşiya. Dûr meşiya hûr meşiya, hat li ber avahiyeke mezin û kevnare rawestiya. Destên wê mîna pelê berbabûyî diricifîn û dilê wê mîna daholê lê dida. Ji ber ku ew avahiya mezin û kevnare mala wê pirejinê bû. Li wê malê hatibû dinyayê û heta heft saliya xwe, tevî xwîşkên xwe li wê malê mezin bûbû. Rojê sê caran li wê malê berê xwe didan rojê. Sê şibakeyên malê hebûn û her danekî li ber şibakeyekê, berê xwe didan rojê û silav li rojê dikirin.





Paşê, şevekê gur daketin bajêr. Şeveke zivistanê bû. Heta çokan berf bariyabû û bagerekî sar diguvguvand. Di wê şeva zivistanê de guran li deriyê wan xistibûn û gotibûn;

- Keçikno, ev mal ne mala we ye lê mala bizinan e. Herkes pê dizane ku navê vê derê Birca Bizinan e û we mala bizinan dagir kiriye. E mê we ji vir derxin û bişînin heft bajarên xerîb.

Bi ya xwe kiribûn. Ew ji malê derxistibûn û her yek şandibûn bajarekî xerîb. Her yekê xwe li bajarekî girtibû. Li wan bajarên xerîb jî stare nebûbûn û her yek li derekê, li bajarekî bûbû stêrk û çûbû ezmanan. Pîrejinê heft sterkên ezmên şibandin xwe heft xwîşkan. Piştî salan, biçûka her heft xwîşkan niha mezin bûbû û bûbû pîrejineke heftê salî. Hesreta heftê salan ew ber bi bajarê zaroktiya wê û mala wê ve kişandibû.




BIRCA KEÇIKAN






Pîrejinê bi destên xwe yên ricifok deriyê hesin ê avahiyê dehf da lê derî miftekirî bû. Û bi ser de derî jî ne deriyê zaroktiya wê bû; wek kolan û şêniyên niha ku ne kolan û şêniyên zaroktiya wê ne. Deriyê zaroktiya wê textîn bû lê ev derî hesinî bû. Pîrejinê vê carê gopalê xwe hilda û sê caran li deriyê hesinê xist; teq, teq, teq…


KEÇİ BURCU

Bi teqiniyê re gurên di nava avahiyê de ji xeweke giran  şiyarbûn. Tavilê postên bizinan ên li ber serê xwe kişandin serê xwe û bi tirs li çavên hev nêrîn. Ji nav guran yê herî pîr çû berderî.

-Ki ye ev, got bi zar û zimanê guran.

-Ez im, got pîrejina li derve, “ez xwediyê vê malê me” û lê zede kir; “Zaroktiya min li vir derbas bûbû hemû bîranînên min li vê derê mane. Ez ê rahêjim wan û dîsa herim.”







Gurê pîr ku postê bizinan li xwe kiribû mesele fam kir. Ew roja zivistanê hat bîrê. Ji ber ku wê demê ew jî di nava wan guran de bû ku pîrejin tevî xwîşken wê ji malê derxistibûn. Piştî mesele fam kir çav lê çirûsîn û got:

-Ev der birca bizinan e û tenê bizin dikarin werin vê derê, qey tu bizin î?

Piştî vê gotinê hemû gur bi huqehuq keniyan û henekê xwe bi pîrejinê kirin. Ji her gurekî dengek derdiket;

Ka qiloçên xwe şanî me bide!
-Kanî simên te bizin xanim?
-Porê te spî ye tu fedî nakî derewan dikî…
Pîrejinê dîsa dubare kir ku ew tenê hatiye rahêje çend bîranînên xwe û here. Dema guran dît pîrejin bûye sing û jiwir venakişe, li hev kom bûn û ya xwe kirin yek ku dolabekê li serê pîrejinê bigerînin.
Gurê pîr hat ber derî û got;
-Bîranînên te va ye li vê derê ne û me di sandiqan de veşartine. Dema wiha got li gurên paş vegeriya û zimanê xwe derxist wek henekê xwe bi pîrejinê bike. Gurên paş zimanê xwe gez kirin ku dengê kenê wan neçe pîrejinê. Gurê pîr lê zede kir; “em ê derî li te vekin û bîranînên te bidin te lê ji kerema xwe here ji me re hemêzek çilo bîne. Em birçî ne û me hê xwrînî jî nekiriye.”



Pîrejinê dît ku heta çilo neyîne wê derî venebe, ji neçarî berê xwe da Bexçeyê Hewselê da ku hemêzek çilo bîne. Dema pîrejin çû, guran postên xwe derxistin, karxezala ku roja din li Hewselê girtibûn danîn ber xwe û dest bi taşteya xwe kirin.

Pîrejin li nava Hewselê geriya û negeriya dareke şîn nedît ku hemêzek çilo birûçikîne. Dema zaroktiya min ev der hemû dar û ber bûn got di dilê xwe de. Pir çû hindik çû ji bajêr dûr li qerexa rêyekê rastî dareke biçûk û çilmisî hat. Li darê vegeriya û got:



-Ho dara topik, xweşik û rindik ka hemêzek çilo nadî min ez wî çiloyî bibim Birca Bizinan, da bizin jî bîranînên min bidin min.
Dara çilmisî serê xwe li pîrejinê rakir û mîna miriyê li ber sikratê ziman giran giran lê geriya;
-Qey xweşikî û rindikiya min maye dayê qurban, tu nabînî ez ji tîna dikim hişk bibim mîna gelek dar û dehlên van deran. Bila çilo bi qurbana te be lê ka ji bo xatirê bîranînên xwe mistek av ji min re bîne, bila çiloyên min ên zer şîn bibin ku bidim te. Pîrejinê li nava çavên darê nêrî ku rast jî tenê du çilo bi serê darê ve mane, ew jî zer bûne û ha weşiyane ha dikin bi weşin.



Pîrejinê dîsa dev da rê û li kaniyekê an jî li çemekî geriya. Lê hemû kaniyên zaroktiya wê yan xira kiribûn an jî miçiqîbûn. Jinik pir çû hindik çû xwe gihand ber çemekî. Pîrejinê bi lava û bergerîn ji çem re got:



-Tu çi çemekî pak û paqij î. Tu çi çemekî wiha şîn û zelal î. Ka mistek av bide min ku wê avê bibim ji dara tûyê re, dar jî hemêzek çilo bide min, çilo bibim Birca Bizinan, bizin jî bîranînên min bidin min. Çem serê xwe rakir û li pîrêjinê nêrî.

- Ava min bi qasî çiravekê maye û ew jî şêlo ye dayêcan. Xêra min ji min re nemaye ez ê çawa xêrê li te û li dara tûyê bikim?

Pîrejin kelogirî bû, bi hêvîşikestî vegeriya ku biçe. Lê dengê çem hat guhê wê;

-Berê keç û xortên bajêr dihatin li qeraxê min distran, direqîsîn û govend digerandin. Heke rojekê ew keç û xort werin dîsa li ber min bireqisin û bistrin wê ava min jî şên û çoş bibe.





Pîrejinê çavê xwe li derdorê gerand lê ne jinek, ne xortek ne jî zarokek. Jixwe qasek berê ji nava bajêr hatibû û li wir jî kesek tunebû. Li ser kevirekî rûnişt, serê xwe spart gopalê xwe û bihêvisarî li dûrahiyê nêrî. Heft stêrkên li ezmên ber bi hevhatibûn. Her diçû nêzîkî hev bûn û ji nişkava xwe avêtin hev, bûn stêrkeke mezin û rewnaq.
Pîrejinê bi şaşwazî û bi kelecanî li stêrkan temaşe dikir. Stêrka mezin ku demekê li dora xwe zivirî paşê rijiya û ket şikefteke li quntara çiyayên hember.



Heta pîrejin here şikeftê wer dît ku bi sedan keç û xort, kal û pîr dikişin ji şikeftan, ji malan û daristanan. Bi awaz û stran, bi tilîlî û govend ber bi çem tên.
Ava çemê ku qasî çiravekê mayî her çû zêde û zelal bû. Pîrejinê û şêniyê dorhêlê ava çem a zelal cihok bi cihok birin ser hemû dar û dehlan.



Dar ji nû ve şîn bûn û her der bû wek Baxçeyê Hewselê. Karxezal û kîvroşkan dan pey hev, çivîk û pepûkan deng dan hev. Gurên ku dengê tililî û govenda jinan, dengê çivîk û pepûkan bihîstîn tavilê xwe dan hev û bi tirs derketin, revîrevî berê xwedan çolan.

Pîrejinê hê jî fam nekiribû. Çi dibû û ew çi gur bûn ji mala wan derketibûn.







Di nava koma keç û xortan de çavê wê li xwîşkên wê ket. Hevûdu bi hesret hemêz kirin û şûnde xwîşka herî mezin jê re qal kir;
Em jî wek te piştî salan hatin mala zaroktiya xwe ku bîranînên xwe bibin. Lê bizinan heman rêya ku dan ber te dan ber me jî. Pişt re me fam kir ku ew ne bizin lê gur in. Gur in lê postê bizinan li xwe kirine. Yên ku wê şeva zivistanê em ji malê derxistin jî dîsa gur bûne û postê bizinan li xwe kirine. Dema pirs bi pirs em gihîştin dar û çeman, wan ji me re qal kir bê mesele çi ye. Êdî em li benda roja xwe bûn ku war û şarê xwe ji guran paqij bikin.

Her heft xwîşkan hevûdu hemêz kirin û di nava tilîlî û stranan de çûn Birca Keçikan. Tevî şêniyê bajêr mala xwe şuştin, veşuştin û wek berê xemilandin. Êdî roj li ber hilatinê bû. Ewrên reş belav bûbûn. Zeraqên tavê li pişt çiyayên asê şewqa xwe dida ezmanê şîn û aso bi rengekî sor dixemiland. Her heft xwîşk tevî keç û xortên ku alîkariya wan kiribûn çûn ber pencereya li rojhilat dinêre. Berê wan li asoyê, çavên wan girtî û xêrhatin li roja nû kirin.









